" Kurteyek leser Lur "

Amadekar : Wehîd Kemalî Îlamî

Pêşekî

Lurekan weku beşêkî gewre le pêkhatey komelgey Kurdewarî u danîştwanî zincîre çiyaî dirêj u pan u berînî zagros, her le seretay destpêkirdnî jiyanu mêjuy nûsrawî şarstanîyet le dawênî şaxu daxekanu deştu dolekanî em cugrafiyayye jiyan u be parastnî zewî u kulturu zimanekeyan w...htd, rolêkî yekcar berçawyan heye le hemû biwarekanda nek tenha le nawçekanî dêrînî nêştecîbûnî xoyan, bigre le zor rûdawu pêşhatî komelayetî, ramiyarî, abûrî, serbazî, kulturîu… htd, ke le nêwan dewletu netewe drawsêyekanî roydawe. Lurekan le zor bwarda bineretîtrînu serekîtrîn berdî binaxey şarstanîyetu pêşkewtine mirovayetyekanyan danawe le asiyay nawînu rojhelatî nawerastda.

Ew asewaraney ke le nawçe Lurnşînekanda dozirawnetewe nîşanderî ewen ke ber le (80-100) hezar sal pêş zayîn, mirov lem nawçane jiyanî beser birduwew mêjuy şarstanîyetu şarnişînî le nawçe Lurnşînekan be giwêrey zor lêkulînewey zanstîu ekadîmîu meydanîu peydabûnî zor asewarî kon degerêtewe bo diwanze (12000) hezar sal ber le zayîn, eme ew zanyarîu mêjuweye ke ta êsta be dest kewtuwew hîç dûr nîye ke le dahatûda le encamî lêkulînewekanu peydabûnî asewaru nîşaney dîke em mêjûye bgerêtewe bo diwatir.

Sereray ew hemû be serhatu alugoraney ke be drêjayî çendîn hezar sal be ser em beşe le netewey Kurd hatuwew her çende tenanet ziman u zarawey Lurî nehatuwete ser rêziman u rênus u dabu nerît u kultur u edebu mosîqau zarawew zimanî Lurî hêşta be şêwazêkî zarekî mawetewe, belam pêkhatey komelgey Lurî ewende konu rîşedaru qayme, ke ta êstaş zorîney taybetmendye resenekanî xoy be başî u xawênî parastuwew hewldanî neyaranî netewey Kurd bo tiwandinewey Lurekan le nêw xoyan neytiwanîwe bigat be encam.

* Watay wişey "Lur"

Sebaret be watay wişey " Lur " yan " liwêr " yan " lêr " çend bîru boçûnî corawcor le aradaye, em wişeye le hendê le nawçe Lurnşînekan bew cêgayane degutrêt ke darstanî çirupiryan heye, le ber ewe hendê kes lew birwayedan çunke zorîney nawçe Lurnşînekan şaxawîu darstanîn, boye nawî Luru Lurstaniyan beserda birawe, mîr şerefxanî bidlîsî mêjûnûsî be nawbangî Kurd ke le qonaxêk le serdemî sefewîyekan le baregay şah tehmasbî sefewî karubarî nawçe Kurd u Lurnşînekanî jêr deselatî sefewîyekanî pê sipêrdrabû le pertukî şerefname cige lewey ke le Lurekan weku yekêk le hoze serekîyekanî netewey Kurd nêwdebat le ser ew birwayedaye ke em beşe le netewey Kurd boye nawî Luriyan be serda dabirawe ke le melbendî "manrûd" (nawçeyekî başûrî rojhelatî Kurdistane le nizîkey kendawî hurmuz) gundîk heye be nêwî Kurde u le nizîkî ew gunde derbendêk heye ke be Lurî pê delên "kûl", le nêw em derbendeş şiwênêk heye ke nêwî "Lur" e u leber ewey reçelekî hozu xêle Lurekan le sereta danîştuy ew şiwêne bûne boye nawî xoyaniyan nawe be "Lur".

Le layekî dîkewe le bakûrî şarî Lurnişînî endîmişk ke êsta dekewête parêzgay xuzistanî Êran şarêkî konu ruxaw heye be nêwî "lûr" ke asewarî çendîn împratorîyet u deselat, weku, madekan, partekan, sasanîyekan, eşkaniyekanu seretakanî serdemî îslamîyet tiyaîda dozrawtewew hendê le mêjûnûsan birwayan waye ke em şare kewtuwete ber şalaw u hêrşî mexolekan u lenêw çuwe, ca le ber ewey em şare cêgay baw u bapîranî Lurekan buwe nawî Lur u Lurstanîş lewiyewe dêt. Hendê bîr u bawerî tirîş heye ke le ber ewey le rastîda nizîk nînu hîç belgeyek bo selmandiniyan le arada niye amajeyan pê nakeyn.

* Lur kên u regeziyan çîye ?

Le çwar çêweyekî giştî weku hemû netewe arî u Êranîyekan bêguman Lurekanîş beşêkin le regeze resenekan ke tenanet berle nûsînî yekem laperekanî mêjûş nîştecêy ew nawçane bûnu be hezaran sale tyaîda dejîn.



Duktur nêgehban ke yekêke le pispore dêrîn nasekanî Êran u besalan lêkolînewew lêgerînî kirduwe le tepe u girdekanî çiqazenbîl, çiqamêş u heft tepe , delêt Lurekan heman îlamîyekann, ke be lanîkem şeş hezar sal mêjûyan heye lem nawçane. Dîtramanî fransewî (ferensî)u hutum şîndler le ser ew baweredan Lurekan heman "gûtîyekan u loloiyekan"in ke le danîştwanî dêrînu zor konî zincîre çiyay zagros bûn.



Hendêkî dîke le mêjûnûsanu pisporanî mêjûnas reçelekî Lurekan degerênnewe bo "kasîyekan" ke le gel gelanî dîke yekêtî sê layeneyan le rojaway Êran pêkhêna le pênaw damezirandnî dewletî mad u le kotayîda madekan le salî (612)î ber le zayîn dewletî aşûriyan be tewawetî şikistda u şarî neynewayan dagîr kird.
Derbarey regezî resenî kasîyekanîş bîruray ciyawaz heye u hendê piyanwaye kasîyekan "arîn"u hendêkî dîkeş delên "aziyanîn"u ber le arîyekan u madekan nîştecêy zagros bibûn.

* Zarawe u zimanî Lurekan

Le ber ewey zarawew zimanî Lurî be şêweyekî zanstiyane îşî rêzimanî u lêkolînewî le ser nekirawe u ta êstaş Lurekan be taybetî ewaney ke nîştecêy nawçe Lur nişînekanî wilatî Êranin rêzimanêkiyan nîye bo nûsînî zimanekeyan, zor layen weku farsekan u turke azerîyekan hewliyandawe Lurekanu şêwe zarî Lurî weku beş yan liqêk le netewew zimanekanî xoyan le qelem biden, yan bo ewey ciyawazî bixene nêwan Lur u Kurd, zarawey Lurîyan be zimanêkî ciyawaz le zimanî Kurdî pênase kirduwew çendîn tiyorî dûr u dirêj u belgey saxteşiyan bo taşîwe.
Ewey ke şêwe zarî Lurî beşêkî ciyaî helnegire le baqî şêwe zarekanî zimanî Kurdî le layen zor kesayetî payeberzî zimannas u lêkuler u deyan pispor u şareza le biwarî zimanda pişt rast kirawetewe, eger pisporanî zimannas u netewenas ew derfeteyan bibwaye ke lêkolîneweyekî meydanî û zanistî u pratîkiyan kirdba le ser şêwe zarekanî zimanî Kurdî le her çiwar parçey Kurdistan be gştî u nawçe Lur nişînekan be taybetî sedased hîç dû dilîyekî nedema lewey ke nek tenha şêwezarî Lurî, belku dabu nerît u kultur u zorîney faktere komelayetîyekanî komelgey Lurî legel baqî pêkhatekanî netewey Kurd weku yekin u mêjûyekî hawbeşu dêrîniyan heye. zorbey pisporanî zimannas şêwezarekanî zimanî Kurdiyan bemşêweye polên kirdutewe.

1- Kirmancî jûrû
2- Kirmancî nawerast

3- Kirmancî xwarû
4- Goranî

Ke her kam lem şêwe zaraneş be giwêrey ew dîmografiyau cugrafiyayeî ke be karî dênin çendîn liqî coracoriyan heye ke emeş nek ciyawazî nîye, belku dewlemendî ziman u şêwe zarekanî Kurdî pîşan dedat. Zarawey Lurîş deçête çiwarçêwey şêwe zarî kirmancî xiwarû ke bo xoyşî çendîn şêwe zarî corbecorî heye weku zarawey xormawayî (xurem abadî), bextiyarî, buyir ehmedî, mamesenî (memesenî), kêwe gêlu, zarawey dizpêlî (dizfulî)u endîmişkî, zarawekanî buşehrîu hurmuziyanî, deştistanî u tengistanî, berdistanî, şiwankare u ...htd ke zorîneyan zor le yek nizîkin u be başî le yektir têdegen u herweha hezaran wişey hawbeşiyan heye legel şêwe zarekanî dîkey zimanî Kurdî.

* Ayîn u ayînza le nêw Lurekan

le diway derkewtinî îslam, Lurekan ayînî îslamiyan wergirt u êsta zorîney pêkhatey komelgey Lurî musilmaninu le ser ayînzakanî şîe u sunnen. Lurekan le diway dameziranî deselatî sefewîyekan le Êran her weku netewekanî dîke, yan be zebrî şimşêr, yan le pênawî berjewendî u manewe ayînzay şîeyan wergirt u beşêk le Lurekan, ke le jêr deselatî osmanîyekan mabûn le ser ayînzay sunne manewe, belam êsta nizîkey le sedda newedî (90%) Lurekan le ser ayînzay şîen. Beşêkî kemî Lurekan le ser eayînekanî dîke weku yarsan u behayî u cûleke u mesîhîyetin.

* Jimarey Lurekan

Be hoy ewey ke heta êsta serjmêrêkî rasteqîne u zanistiyane u meydanî leser Lur nekirawe u hîç organ yan rêkxirawêkî fermî em îşey nekirduwe, boye amarêkî rasteqîne u bawer pêkiraw lem bareye le arada nîye, belam be giwêrey ew amaraney ke dewletanî Êran u Êraq sebaret be danîştiwanî parêzgakaniyan deriyan xistuwe u be leberçawgirtnî rêjey ew Luraney ke le parêzga qeyre Lurekanda dejîn(mebest ew parêzgayaneye ke be giwêrey xerîtey fermî sinûrî parêzgakan beşêkî zor le Lurekan u nawçe Lurnişînekaniyan le cemawer u nawçekanî xoyanda dabrîwe), jimarey sercem Lurekan le wilatî parçekirawî Kurdistan u nawçekanî dîke degat be (9000000) "no milyon kes" ke zorbeyan danîştuy rojhelatî Kurdistann.

* Cugrafiyay nîştecê bûnî Lurekan

Zorîney ew şiwênaney ke Lurekan tiyayda nîştecên helkewtute rojhelatî Kurdistan u be diway ewe jimareyekî zorîş le Lurekan danîştuy başûrî Kurdistan u wilatî Êraqin.

Le wilatî Êran nizîkey 7 parêzga be tewawetî be cemaweru cugrafiyay siroştî u ramiyarîyewe jîngey mêjuyî u hawçerxî Lurekane ke emanen :
Luristan yan xormawa (xurem abad) - çiharmehal u bextiyarî –kohgîluye u buiyr ehmed - parêzgay şîraz ke êsta be fars denasrêt– merkezî (erak) - buşehir- hurmuziyan (hurmuzgan).

Cige leme Lurekan u nawçe Lurnşînekan beşêkî le pêkhatey komelayetî u cugrafiyaî em parêzgayane pêkdênin wate parêzgakanî :
kirmaşan – îlam - hemedan – esfehan - başûrî kirman -xuzistan.

le başûrî Kurdistan u wilatî Êraq Lurekan lem parêzgayane nîştecên:
hewlêr (erbîl) – kerkuk – silêmanî – diyale – wasit - mîsan.

Wate le şaru şaroçkekan u deştekanî weku: çemçemal, xaneqîn, dûzxurmatu, cilewla, deştî hewlêr, deştî koye, şarezûr, deştî bîtwên, menelî (mendelî), cesan, tirsaq, heşîme, zirwatiye, bayray(bedre), elî qerbî, elî şerqî, baxisay, kût u...htd.

Ciyawaz lemane jimareyekî zor le Lurekan le derewey cugrafiya u nawçekanî xoyan dejîn, bo wêne beşêkî zor le Lurekanî Êran le bakûrî Êran le parêzgakanî gîlan u mazenderan, le bakûrî xorhelsan(xurasan),qezwin, zencan u nawçey sayîn qelay parêzgay azerbacanî rojawa dejîn ke zortir le xêlekanî "çignî" , "papî", "beyranwend"u "çardolî (çerdawilî)n. beşêkî dîke le Lurekan ke le

bineçekda le xêlî mamesenî (memesenî) nawçey nûrabadî şîrazin kewtûnete parêzgay sîstan u belûçistan . Le wilatî Êraqîş cige lew Luraney ke danîştuy nawçekanî başûrî Kurdistan u lêwarî sinûrî Êraq u Êranin heta parêzgay mîsan, jimareyekî zor le Lurekan (ke hendê le serçawekan jimareyan be milyon degeyenn) danîştuy şare gewrekanî Êraq weku bexdan ke be "Lur yan Kurdî feylî" nasirawin.

Girupêkî dîkeş le Lurekan danîştuy wilatî turkiya u bakûrî Kurdistanin ke le başûrî Kurdistanewe koçber kirawin bo ew wilate, weku xêlî "şêx bizeynî" ke beşêkiyan le nawçey "haymana" le parêzgay enqere(ankara)dejîn. Be giwêrey hendê serçawey nafermî jimareyek le Lurekan le çiwarçêwey xêl u eşîret ke renge jimareyan bigat be 50,000 kes danîştuy wilatî israyîlin u mêjûyêkî taybet be xoyaniyan heye. Beşêkî dîke le Lurekan danîştuy resenî wilatanî lubnan , suriya,(berzaiyekanî gulan yan culan),kuweyt,behrên û rojeaway pakistanin.



Cugrafiyay Lur le eran

* Cugrafiyay siroştî u serçawe siroştîyekanî nawçe Lurnişînekan

Zorîney cugrafiyay siroştî nawçe Lur nşînekan be taybet le rojhelatî Kurdistan şaxawînu le zincîre şax u daxî berz u nizm u zor derbend u deştu dol pêkhatûn u le nîwe zortrî zincîre çiyaî zagros le xo degrin.
Berzayî şaxekan le hendê nawçe weku çiyay "dina" degate 4500 metr, zorbey melbendekan daristanî u çirupirin û be hoy barînî befr u baran be radeyekî baş çendîn çem u rûbarî gewrew biçûk lem şaxanewe serçawe degrin ke le serçawe serekîyekanî aw le Êranin. Le başûrî Kurdistan u Êraq zorîney ew nawçaney ke Lurekan tiyaîda nîştecên germiyanin u pêkhatûn le deştî pan u berîn u şaxi hewraz u nizm.

Be şêweyekî giştî ajeldarî u kiştukal pêşey serekî xêle Lurekane u be hoy zor hokarî ramiyarî u mêjuyî pîşesazî lem nawçane perey nesenduwe.

Hem le Êran u hem le Êraq nawçe Lurnşînekan zor serçawey firawanî newt u gaziyan heye, cige le serçawe newtîyekanî nawçe Lurnşînekanî başûrî Kurdistan u Êraq weku germiyanu dewruberî xaneqîn u banê mîl, le wilatî Êran le sedda heftay (70%) newt u gazî ew wilate le nawçe Lurـu Kurdnşînekan berhem dêt wate le parêzgakanî kirmaşan, îlam, kohgîluye u buyer ehmed, buşehr u bakûr u rojhelatî parêzgay xuzistan ke şiwênewarî çend hezar saley Lurekane, cige le dewlemendî em nawçane le biwarî serçawe here girîngekanî newt u gaz u aw, be deyan kangay girîng u sitratîjî weku : zêr, asin, çendîn çeşin berdî be beha, sîlîs(şûşe), çîmento, geç, berdî xeloz, misîne (ms), mîka, gugird, alumînîum, azbest, qum u lim, xiwê w...htd lem nawçaneda heye.

Lurekan le ser lêwarî kendawî hurmuz nizîkey şeş sed(600) kîlometr sinûrî awîyan legel deryada heye, wate le benderî "deylem" le parêzgay buşehrewe heta lêwarî tengey hurmiz le parêzgay hurmuziyan (hurmuzgan).

* Kurteyek le mêjuy ramiyarî Lurekan

temenî ramiyarî komelgey Lurî mêjûyekî dûr u dirêjî heyew Lurekan le hemû qonaxekanî mêjuy ramiyarî-komelayetî Êran u Êraq u nawçeke her le konewe bigre ta êsta rulêkî berçawiyan gêrawe. Her le serdemî împratoryetî îlamu madekan u dewletanî hexamenêşî, eşkanî, sasanî, efşarî u zendîyekanewe heta degate sefewîyekan, osmanîyekan, qecerekan, pehlewîyekan u Êraq u Êranî êsta, Lur le hawkêşe ramiyarî u komelayetîyekanî nawçekeda rolî xoy bînîwe. Hendê car xawen deselat u dewletî taybet be xoyan bûnew hendê carîş be yarmetî u hawbeşî u yekêtî legel gelanî dîkey Êran be şêwazêkî hawbeş deselatiyan berêwe birduwew nawçe Lurnşînekan u Êraniyan parastuwe le beranber dujminî hawbeş. Le serçawe mêjuiyekanda zor babet u amaje heye sebaret be beşdarî u deselatdarêtî Lur be taybet le Êran u karîgeriyan leser hawkêşe ramiyarî, abûrî, serbazî u komelayetiyekanî nawçekeda. Cêgay amajeye ke yekemîn damezirawe u hizbî Kurdîş ke helgirî nasname û alay nasîunalîsmî Kurd buwe le layen kesayetiyekî Lur rêk dexrêt wate " hizbî hîway Kurdistan " ke lelayen " refîq hilmî " ke xoy Lur buwe dademezrêt .

Lurekan çendîn fermanrewayî u dewletî taybet be xoyaniyan buwe ke girîngtirîniyan emanen :

1- Dewletî kasîyekan ke diwatir legel gelanî dîkey nawçeke êmpraturiyetî îlamu madiyan damezirand.

2- Dewletî sasanîyekan ke Lur beşêkî zor lem deselate be destî Lurekanewe bû.

3- Dewletî hezar esp ke fermanrewaiyekî serbexo u xawen destur u deselatêkî dadperwer u bê wêne buwe le nawçekeda.

4- Fermanrewayî dînewer u şarezûr ke be "hesnewîye" benawbang bûn.

5- Fermanrewayî fezluiyekan ke be "Lurî gewre" nasirawin.

6- Fermanrewayî etabekanî Lurî biçûk ke weku dewlet deselatdarêtiyan kirduwe.

7- Dewletî zend (zendîyekan) be rêberayetî kerîm xanî zend ke le xêlî zendî nawçey mile ayir (melayr- mile agir)î Lurstan buwe.

8- Fermanrewayî walîye feylîyekanî "piştko"u "pêşko" ke zortir le sêsed sal deselatdarêtiyan kirduwe.

9- Çendîn fermanrewayî dîke weku : fermanrewayî zengî, fermanrewayî ertiqî, fermanrewayî şah ermen w...htd, ke be hezaran sal yek le diway yek deselatdarêtiyan kirduwe.

bibi miryem bextiyari

kerim xani zend

قدم‌خیر یکی از زنان رشید ایل قلاوند

qedem xeyr

Xulam reza xan-wali

serdar esed bextiyari

reis eli dilwari

Le salî 1928 z diwayîn deselatdarêtî nawçeyî Lurekan be fermanrewayî "xulam rezaxanî ebûqedare" ke le nawçey piştko (parêzgay îlamî êsta) bibû, le layen reza şay pehlewîyewe be bê şer u pêkdadan le nêw çû u be royştinî xulam rezaxan bo Êraq, deselatdarêtî xocêyî Lurekan kotayî pêhat.

Lurekan le mêjuy ramiyarî u têkuşanî azadî xiwazaneyan beranber be dagîrkeranî derewe u nawewe le seretay sedey bîstemewe u be dameziranî deselate dagîrkere nawendîyekanda heta êsta xawen çendîn şoriş u bizutinewey be nirx u kesayetî gewre u benawbangin, cige lew kesayetîyaney ke rolî paşayetiyan gêrawe le mêjuy konî em beşe le netewey Kurd, bo wêne :hurmiz (serkrdey supay Êranîyekan le katî sasanîyekan u şer legel erebekan), kerîm xanî zend u ...htd le sedey rabirduş zor kesayetî benêwbang u xulqênerî mêjuy xebatî azadî xiwazyan buwe ke le çarenûsî hawkêşekanî ramiyarî nêwxoy Êran u Êraq karîger bûne u rolî yek lakereweyan bînîwe, bo wêne dekrê le: bizutinewey gewrey serdar esedî bextiyarî le katî meşrute xiwazî le Êran - serheldanî dilÊranî tengistan be serkrdayetî reîs elî dilwarî le dijî brîtanîyekan u prteqalîyekan - şoriş u berxodanî qeyem xeyr (qedem xeyr)u brakanî dij be supay rezaxan u brîtanîyekan - bizutinewey bîbî miryemî bextiyarî dij be deselatî nawendî le serdemî pehlewî – şorişî key Lurasibî batûlî buyer ehmedî dij be deselatî nawendî Êran– bizutinewey melaxulam hisênî syahpûrî buyr ehmedî dij be deselatî nawendî Êranu tenanet bizutinewey esmaîl xanî sewlet elduley qeşqayî ke be yarmetîu piştgirî xêle Lurekan dij be deselatî nawendî Êran pêkhat u kesanêk weku tewfîq wehbî beg le serdemî şêx mehmûdî hefîd u r efîq hilmî serkirdey hêzbî hîway Kurdistan le başûrî Kurdistan u Êraq nêw bibrdirêt. Zor kesayetî u colanewey dîkeş le nêw Lurekanda heye ke lem kurteye derfetî amaje pêdaniyan nabêt.

* Erkî neteweyî hemû layenekan

her weku pêkhatekanî dîkey netewey Kurd be diway pênase kiranî çemkî neteweyî le wilatanî Êran u Êraq u turkiya u suriya u hemû nawçekeda, Lurekanîş kewtine ber şalawî şovînîzmu le layen netewekanî serdestewe tûşî qeyranî şunas u deselat u ramiyarî sîstmatîk bibûn. Ramiyarî çewaşe u mebestdarî nawendekanî deselat le layekewe u kemterxemî u serlêşêwawy u na azayetî nuxbe u runakbîre Lur u Kurdekanîş le layekî dîkewe bibû behoy ewey ke em pêkhate gewreyeî netewey Kurd le hemû biwarêkda tûşî qeyranî şunas u hebûn bibêt û le cestey netewekey bibirdirêt. Lurekan be taybetî ewaney rojhelatî Kurdistan be hoy gelêk hokarî mêjuyî, ramiyarî, abûrî, bazirganî, cugrafiyayî, ayînzayî u...htd, hem le baqî pêkhatekanî dîkey netewey Kurd dabirawin u hem neyantiwanîwe weku pêwîst u be qed u qebarey xoyan beşdarî prosey xebatî rizgarî xiwazî netewekeyan bibnewe u zortir her weku le Êraq u Êran debînîn le jêr karîgerî hêze ramiyarî u komelayetî u kulturîyekanî deselate nawendîyekanî em du wilate mawinetewe.

Lurekan ziyatir le yek sedeye ke be bê hîç rêkxirawe, organ yan dezgayekî behêzî perwerdeyî, kulturî, runakbîrî u ramiyarî taybet be xoyan kewtûnete ber pelamar u hêrişî ziman u kulturî dam u dezga ruxênere biyanîyekan u be bê hîç amrazêkî parastinî şunasekeyan tûşî proseyekî gewre u metirsîdarî mêjuyî tiwandinewey sîstimatîk bûnetewe u roj bediway roj qeyranî şunas le nêwiyan qultir debêtewe.

Le hel u mercêkî wehada erkî hemû kesayetye runakbîre Lur u Kurdekan u hêz u rageyandin u organ u rêkxirawe neteweyekanî pêkhatekanî netewey Kurde ke le hemû biwarekanda behayekî zortir u tenanet "taybet" biden le pênaw jiyanewe u bujandinewey dabu nerît u kultur u şunasî rasteqîney em beşe le netewekeman, boye çî Lurekan be taybet ewaney rojhelatî Kurdistan le diwarojda entêgrey netewekeyan bibn yan nebin, girîng eweye ke dabu nerît u ziman u kultur u şunasî Lur weku beşêk le dewlemendî şunasî netewekeman u danîştwanî zagros lenêw neçêt u paktaw nebêt. Bo em mebesteş girîngî dan u pêşxistnî mosîqa u huner u zarawe u kulturî Lurî be taybet le rêgay rageyandinekanewe u damezirandinî dam u dezgay fermî taybet be Lur berdî binaxey likandin u gerandinewey Lur be baweşî netewekeyetî.

/Nêzîk hun ê karibin van zanyariyên giring bi Kurmanciya jorîn bixwînin/.